

Poems from the world poetry

**Lîska aşîtiyê**

Zaro li hewlê  
cengê dilîstin,  
wan cenga xwe  
bi dengberzî û qêrînî dilîstin.

Di pencerê re  
min bang wan kir:  
Ma carekê aşîtiyê bilîzin!  
Li wê bawerê bûm  
ewê weha ne qêrînin.

Zaro li jêr  
li hewlê bi kelecana bûn:  
Ka em aşîtiyê bilîzin!  
Bi hev re bi yek  
dengî qîrandin.

Û hizirdikirin,  
wê çî bikin,  
ramandikirin bi devjengî,  
careke din ji nû ve,  
û paşê bangkir

Kurekî  
bervê xwe da pencera min:  
Apo! Mera çawa aşîtiyê dilîze?

**Peter Schütt**, Elmanîya, 1939  
Husên Hebeş ji elmanî wergerand kurdî

## **Sîyayî**

Li dirêjahîya dîwarê dêrê  
sîya te li dor qunc  
li ser her kevirî  
bi giranî dilive  
tibê ew dixwaze hesta  
sîya min bigire,  
wî pir hewilda  
rêçên xwe bihêle  
di ber çûyînê re.

## **Guhdarî**

Ez tim  
pirtir dibîhsim  
ji ewa tu dibêjî  
tibê tu  
bi hezar zimanan  
dipeyivî  
û tevî wê jî  
pir nabêjî.

**Christel Ungar**, Romanîya, 1966

Husên Hebeş ji elmanî wergerand kurdî

## **Berf**

Tu bi hêminî hatî  
çawa berf tê  
û beyanî dil  
tev sipî bû  
û nizanî çi bibêje.

Te ez nixumandim  
wek binefşeke tewrî biçûk  
û min bihîst henaseya  
sipîye erdê ya  
bi istirana serşînkê re vedibû.

Wek dara sêvê ez dilerzim  
dema ez te hemêzdikim.

Çiqas hêv îşev dilovan e!

**Renato Fiorito, Îtalîya**

Germain Droogenbroodet û Wolfhang Klink wergerandine elamnî  
Germain Droogenbroodet û Stanley H. Barkan wergerandine îngilîzî  
Husên Hebeş herdu minhoyên elmanî û îngilîzî daneberhev û wergerand  
kurdî

Ithaka 517

**Dar di bayî de dimîne**  
(Bo Germain Droogenbroodt)

Dar ne tişt e, eger ba tune be,  
ez ne li wê bawrîyê me, ku ew bimîne  
eger ba wê ne livîne.  
Dar jî mîna her tiştî ye,

wêne, helbest, foto, belge,  
alîyê din ji koka xwe, rehên xwe, henaseya xwe,  
xwe bi ava xwe diparêze,  
bi êzingê xwe, yê agir dişewitîne, û bi bayê  
ku dixwaze wê di şeveke bahozî de bişkîne.

Dar xwe bi bayî digewrê  
her yek bi tenahîya xwe wê dibîne.

Dar dijî eger ew xwe bilivîne  
di bayî de yan di ramanan de,

wek helbestekê dema ew mera ditengijîne.

**Jose Eduardo Degrayia, Berazîl**

Ji „A Nitidez das Coisa – La Nitidez de las cosas”.

Germain Droogenbroodet û Wolfhang Klink wergerandine elamnî  
Germain Droogenbroodet û Stanley H. Barkan wergerandine îngilîzî  
Husên Hebeş herdu minhoyên elmanî û îngilîzî daneberhev û wergerand  
kurdî